DABEŞKIRIN TAKEÇARESERIYA IRAQÊ YE

Şivan Şêxo

Piştî çend salên xwînawî, tirajedî û karêsatên mezin hatin ser gelên Îraqê û pişt azadiya Îraqê û ta ku evroke Îraq hemû roja êtûna agirekê dijwar de bûye û xelkê bêgunehê wê tê de sotin û gorepaneka siyasî û leşkerî vekirîbû hember dewletên herêmê û navdewletî ji bo tesfiya hesabatên xwe û çareseriya gêşe û giriftiyên xwe û eve dîwarekê mikûm û rêkgir bû li ser çareseriyên dorhêla Îraqê. Eve fakterên binçînene heta evroke serûberê Îraqê bi vî rengiye û hêşta hereşe metirsî li ser ayindeyê Îraqa-federal ya nû heye.

Ji layekê dî ve, li ser astê navxweyî û li ser astê navdewletî jî heta nûke weku pêdivî têgehek dirust li ser pêkhata Îraqa nû dirust nebûye. Hemû hel û bizavên salên bûrî di Îraqê de hatine encam ji layê siyasî û leşkerî bo hindê, bûye Îraqa yekgirtî dirust bikin, weku caran Îraqê pêk ve peçrîm bikin. Eve jî mehale ku Îraqa caran bihê pêkanîn û çar salên borî evê rastiyê baş diselmînin.

Qonaxa dahatî ango li heyvên bihên de pitir rawestan û danûstandin dê li ser dorhêla Îraqa nû bihê kirin û bi şêweyekê xurtir ango pişt hemla yekê lêkolîn di şîroveyên xwe kirin li ser rewşa siyasî û leşkerî ya Îraqê têgehekê hevpişk li ser astê herêmê û navdewletî, her wesa li ser astê navxweyî jî ew têgehê dirust bûye. Ku eve nêzîkî 4 salaye rojane tirajediyên xwîna wî û karesat û kuştin û derxistin berdewame, ji her du la û hîç encam nebûye. Çendîn salên dî jî berdewam bin, her dizivirin li ser danûstandina; çinkû çi sûd her du layena nebûye ji bilî zerer û ziyanê. Ji ber hindê bi baweriya min demê bê dê pitir piştbest bin ji mafê danûstandinê û guftûgoyê. Ez bi bawerim têgeha ji hemûyê mezintir dirust bûyî li van çend salên piştî azadiyê bo hemû layekê li ser pêkhata dirusta îraqê bûye û selimandin ku Îraq çi car êkgirtî û êk milet û htd. nebûye. Belku ew

cudahiya neteweyî rewşenbîrî kulturî, ayînî baştir ron bû ku weku caran Îraq êkgirtî be. Her pêkhatekê hebûna xwe selimandiye bo destnîşankirina çarenivîsê xwe li ayindeyê Îraqa nû de rêkên çareseriyê û heger fakterên vî serboreyê alozê Îraqê pitir ron bûye.
Bo hemû layekê û li ser astê dewletê ve têgehe bûne xalên giringên rêkeftina civaka navdewletî bo çareseriya kêşa Îraqa nû. Nexasime dewletên hevpeyman Emerîka û Ewropa bi şêwekê giştî ji wana Firansa bo vê qonaxê helwistekê ron û aşkere heye hemberî kêşa û pirsên Rojhelata-navîn bi taybetî û cîhanê bi şêweyekê giştî Îraq tewerê serekiyê gotara serokê Firansa bû. Ne xûyakirin ku civaka navdewletî berpirse ji dorhêla Îraqê û pêdiviye civaka navdewletî bi vê berpirsyariya xwe rabe.

Ji layê navxweyî ve jî encamê gelek danûstandina dîsan têgehekê hevpişk dirûst bûye û ev têgehe bûye rêkeftin di navbera zorbeya layenên kargerî li ser gorepana siyasiya Îraqê. Nexasime bi dirûstkirina berê navxweyî yê çarqolî û hêşta guftûgo berdewamin. Bo hindê hemû layenên Îraqî rêkeftin li ser komeka xalên giring. Bo hindê ayindeyekê geş û ronak bo Îraqa nû peyda bikin û serkirdayetiya siyasiya Kurdistanê rolekê karêger û bi hişyarî û şarezayeka baş ev hewl û bizave serxistine. Belê pirsyarek din dihê pêş, aya çi ayinde li pêş Îraqê ye?
Bê guman gelek rêkên li pêş ayîndeyê Îraqê ji wan:
1-Damezirandina dewleteka demokrat-federal û hevçerx,
2-Şerê navxweyî.
3-Dabeşkirina Îraqê.
Xala êkê ya avakirina dewleteka demokratî-federalî û hevçerx hêvî û bernameyê destpêka azadiya Îraqê bûye heta nûke bi cih nehatiye û

bi pêçewanî hindê roj bo rojê pitir ji nav çûye ayîndeyekê gelş li pêşe. Ji bo avakirina dewleteka demokrat-federalî û ji layekê din ve heta nûke jî eve hizre bi dirûstahî seqamger nebûye û hereşe û metirsiyên mezin li ser vê hizrê ne bi rêka guhartin û destkarî li destûrî de .htd.

Xala duwê şerê navxweyî hindek seyasetmedar wesa didine xûyakirin ku şerê navxweyî hemû berdewame û roj bi rojê tundtir dibe û hindek jî wesa dibînin ku qonaxa şerê navxweyî hêşta yê mayî dest pê nekiriye. Çinkû hemû layenên Îraqî hêşta bi dirûstî nekevine di nav şerê navxweyî de. Qonaxa bihê dibe şerekê mezinê navxweyî li seranserî Îraqê peyda bibe, bo vê çendê jî gelek dewlet û layenên navxweyî û rêxistina qaîde karî bo dikin, bo hindê seqamgirî li Îraqê peyda nebe û dorhêla Îraqê her bimîne devereka ajawe û şerûkuştare û emrîkî ji Îraqê derkevin û bê guman her demê emrîkî ji Îraqê derkevin şerê naxweyî dê mîsogerbe ji hemû layekê ve.

Xala siyê dabeşkirina Îraqê: her li destpêka azadiya Îraqê heta nûke tewerê dabeşkirina Îraqê car bo sê wîlayetan û car bo pênc wîlayetan, car neh wîlayetan; eve hemû proje û rêkên guftûgokirinê bûn li ser çawaniya dabeşkirina îraqê û zorbeya siyasetmedarên şarezayên rewşa Îraqê dabeşkirinê bi takeçareserî dibînin û gelek caran ev bûçûne li ser zarê desthelatdarên Emrîka û navdewletî ve jî hatiye gotin.

Nûke, ango qonaxa dahatiya Îraqa nû dabeşkirin tewerekê serekîban rêka êkê bû çareseriya serûberê Îraqê. Çinku dabeşkirin rastiyeke evroke Îraq li ser 3 wîlayeta ango li ser sê dewletan dabeş kiriye. Dewleta Kurdî, dewleta Şiî û dewleta Sinî. Ev bûye rastî li ser erdî. Êdî pêk ve bêhêne girêdan û ya bûye têgehek jî di nav layenên siyasiyên Îraqê û siyasiyên emrîkî jî li gel seredan, şîro û raportên xwe de dabeşkirinê weku alavekê bi hêz dibin bo çareseriya rewşa Îraqê. Berbijarê serokatiya Emrîka senetorê Sam Birwanba dibêje; "diviya Îraq bihê dabeşkirin li ser sê wîlayetan" her wesa Sindoqa Silama Emrîkî daxwaza dabeşkirina Îraqê kiriye bo sê wîlayetan wesa didine xuyakirin ku eve rêka dirûsta çareseriya rewşa Îraqê ye.

Qonaxa dahatiya nêzîk gorankariyên mezin dê bi ser dorhêla siyasiya Îraqê dihên. Ez bawer dikim her çend rêkên çareseriyê bihêne behskirin her dê dabeşkirin takeçareserî bo dorhêla Îraqê be. Eve jî hêvî û omîda kûr û dûra gelê Kurdistanê ye û Kurdistan li ser astê navxweyî berhevên başiyên heyîn.